Zêr çiqas bimîne …. Hertim zêr e

Kurd dibêjin : **Ga dimre eyar dimîne , mirov dimire nav dimîne** .

Di dîroka gelê kurd de , gelek mirovên giranbuha hene . Ji nav wan , rewşenbîr û siyasetvanê gewre , bi nav û deng , Dr.Nûredîn zaza ye . Ji ber ku , mirovên gorbuhişt , mîna zaza , di dilê gelê xwe de , weke zêr hertim zindîne , wêlomê jî komîta rêvebir ya Munteda Nûredîn zaza , şevek ji bo bîranîna jiyana wî , li şamê , di 7/10/2005 an de , li dar xist . Dora 50 kesî, li wê şevê beşdar bûn . Ji wan nûnerên tevgera kurdî û di pêşî de , birêz Hemît Hec derwîş, serokê partiya Pêşverû yê Kurd li Sûriyê , gelek rewşenbîr û nûnerên rojname û kovarên kurd , Tilivizyona Kurdsat û gelek ronakbîrên Ereb mîna : Ekrem Bunî , Mîşêl kêlo , Cemal Eclonî û Me'az Hemûr nûnerê komîteyên mafên mirovan û komîteyên nûjenkirina civaka sêvîl li Sûriyê û H.W.D **.**

Pirograma şeva pîroz weha bû :

1- Kêlîkek bêdeng li ser giyana hemî pakrewanên demoqrasiyê û bi taybetî jî , li ser giyana nemir Dr. Nûredîn zaza hate rawestandin.

2-Danasînek bi kurdî û erebî ji kesayetiya hêja zaza re .

3-Danasînek bi kurdî û erebî ji xelata zaza ya salane re .

4-Xelatkirina mamoste Hemît Hec Derwîş weke siyasetmedarekî kurd , helbestvan Ferhad Îçmo weke rewşenbîrekî kurd û ronakbîrê ereb , dostê gelê kurd birêz Cad Ebdilkerîm El cûba'î

5-Danasîna bi erebî û kurdî ji hersê xelatdaran re .

6- Gotina xelatdaran ji bilî mamoste Cad ji ber nebeşdariya wî .

7-Gelek gotinên dî ji alyê nûnerê mamoste Xeyredîn Mûrad (Rêvebirê partiya Azadî) nûnerê mamoste Nesredîn , sekreterê partiya Elpartî (beşê di hevben de) , birêz Meş'el Temo rêvebirê teyar Elmusteqbel , Ekrem bunî Cemal Eclonî , Me'az Hemûr , Nama rojnama Newroz û gelekên dî .

Hêjaye em çend têban, ji hin gotinan berçav bikin :

Yek : Mamoste Cemal Eclûnî di gotina xwe de , weha got : Em hêvî dikin di careke din de , bi navê tevgera kurd yek gotin be .

Dudu : Rêzdar Hemît Hac Derwîş , ev şîret li beşdaran kir . Nezanbûnê zora Dr.zaza stand , yanê nezanbûnê zora zanebûnê bir .

Ez hêvî dikim , ji îro û pêve , hûn nehêlin nezanbûn zora zanebûnê bibe

Sisê : Em komîta rêvebir ya weşana Newrozê sipsiya komîta rêvebir ya Munteda zaza ya çandeyî dikin li ser ev ton çalakiyên bi nirx û hertim em jê re piştgirin .

Vaye li jêr emê kurtenama weşana Newrozê, di wê şevê de biweşînin

Newroznamе

Gelî guhdaran ! Dema we xweşbe.

Me vexwenama konîta D.r Nuredîn Zaza , ji ev reng komcivînê re ,li ba xwe weke weşana Newroz , bi gaveke bi cîh û bêlikirî binavkir . Lewre jî , ev bersivnama me ye.

D.R.(5)